



DENACODE NUDDIS

Rêbera ji bo Parastvanan

Nuddis çi ye?

Nuddis sîstemeke dijîtal ya ji bo beşdarbûna li pêşdibistanan e li Şaredariya Bollnäs. Armanca sîstema dijîtal a beşdarbûnê teqezkirin û pêkanîna rêvebirinê ya bicihkirina zarokan e.

Bi rêya Nuddis xebatkar xwe digihînin agahiyan ku pîlansaziya çalakiyan pêkan dike. Agahiyên beşdarbûnê yê aşkera, demên gihîştin û derketinê, çend zarok ê li pêşdibistanê xwarinê bixwin, û hwd. tev dikarin bên bidestxistin. Ji bo ku bikarin çalakiyan hindî ku ji dest hat kêrhatî pîlan bikin, xebatkar ê pêwîst bibînin xwe bigihînin bernameya demê ya zarokê we.

Nuddis sepaneke telefona jîr e (iPhone û Android) û dikare li ser iPadan jî bê bikaranîn. Guherînên ku ji hêla we parastvan bên kirin bi awayekî otomatîk ê ji bo xebatkarên pêşdibistanê rojane bibin. Trafîka nav sîstemê tê şifrekirin û xwedî asteke bilind a ewlehiyê ye. Nuddis wek sepaneke hêsan û alîkarê-bikarîner hatiye sêwirandin. Ev pirtûka destê nêrîneke giştî ya fonksiyonên sîstemê pêşkêşî we dike û dide zanîn çawa hûn dikarin Nuddisê bi kar bînin.



Li destpêk û dawiya rojê

Qeydkirina hatin û derketina zarokê we ji hêla xebatkarê Nuddisê li ser iPadê tê pêkanîn bi “tikandina” li ser wêneya zarokê ji bo venêrîna hatin/derketinê. Venêrîna hatin/derketinê bi rêya tikandina ser wêneyê ji hêla we û zarokê we li gel xebatkar tê pêkanîn, ku wek kesên berpirsiyar ên çêkirina qeydkirinê ne.

Agahiyên girîng ên li Nuddis

Agahiyê derbarê zarokê we û parastvan ê bi awayekî otomatîk ji qeyda zarok a li *Skolplatsen* bê têxistin ku ji hêla Şaredariyê ve tê rêvebirin. Ji bo ku Nuddis agahiyên rojane ji bo we bihewîne, divê hûn agahiyan bi xwe bikevin *Skolplatsen*. Hûn ê hûn jî berpirsiyar bin ji bo ku teqez bikin ku ev agahî rojane ne. Hûn dikarin bi rêya vê URLê bikevin *Skolplatsen*: <https://bollnas.skolplatsen.se>.

Agahiyên berbiçav, girîng, yê wek alerjiyê, dê ji hêla xebatkaran bi şêwirandina li gel we parastvanan di Nuddisê de bînin qeydkirin.

Nuddis sepan

Hûn dikarin Nuddis sepanê bi kar bînin da ku bernameya rojê ya zarokê xwe têkevinê û agahiyên girîng ku xebatkar ji bo vê rojê pê bizanin bişînin.

Sepana ji bo iOS (iPhone an jî iPad) li ser App Store peyde dibe. Sepana ji bo Android li ser Google Play peyde dibe.



Têketin

Wek parastvan, hûn ê bi rêya bikaranîna JimareyaBanqê têkevin sepana Nuddisê û hûn ê bi tenê bikarin agahiyên derbarê zarokê xwe bibînin. Dema têketinê ji we bê xwestin ku hûn navê xwe yê hesab bikevinê, hûn ê vê binivîsin: **bollnas**. Eger hûn xwedî îmkana bikaranîna JimareyaBanqê nebin, hûn dikarin ji xebatkarên pêşdibistana xwe alîkariyê bistînin.


Bikaranîna Nuddisê bi rêya iPhone/iPad

Eger hûn sepana Android bi kar tînin, derbasî beşa dîtir bin.

Carekê hûn wek parastvan têketin sepana iOS, hûn ê pênc bijartekan bibînin: *Bernameya Demê, Danasîn, Dîrok, Profîla Min û Alîkarî*.

BERNAMEYA DEMÊ

Kurteyêke sereke ya agahiyên zarokê we li vir tê nîşandan. Ji bo nêrînê zarokekê bibijêrin an jî bernameya demê biguherînin.



Ji bo zêdekirina bernameyeke demê, roja navborî li ser salnameyê bitikînin û demên danîn û hilgirtinê, mirovê ku dê dayne û hilgire bibijêrin û piştire bi tikandina bişkovka “Çê bike” xilas bikin.

Eger hûn bixwazin heman deman ji bo çend rojan bi kar bînin, bitikînin ser bişkovka “Kopî”. Yekem, roja ku hûn dixwazin jê kopî bikin bibijêrin, piştire rojên hûn dixwazin kopî bikinê û bitikînin bişkovka “Dîtir”. Eger çend zarokên we hebe, hûn dikarin ji bo zarokên din jî heman deman bibijêrin. Dîsa bitikînin ser “Dîtir” û niha we dem ji rojekê bo roja din an jî bo çend rojên din kopî kirin.

Hûn dikarin bi heman awayî deman ji yek hefteya tim bo hefteyên pêşde tînin kopî bikin. Bitikînin ser bişkovka “Kopî” û piştire “Hemû hefte” bibijêrin. Di gava dîtir de, hûn dikarin hefteya ku hûn ê deman kopî bikin bibijêrin, her wisa kîjan navberan ku hûn dixwazin bisepînin.

Kopiera från vecka

Hela veckan Vecka 12 (19/3 - 25/3) >

Måndag (Markerad) 19/3 >

Kopiera till vecka

Vecka 12 Vald vecka >

Vecka 13 26/3 - 1/4 >

Med intervall

Varje vecka >

Varannan vecka >

Var tredje vecka >

Var fjärde vecka >

Var femte vecka >

Raporta Nehatinê

Eger zarokê we ji ber nexweşî an jî çûna derekê timamê rojê neyê, ji we tê xwestin ku hûn guherîna di dema zûtirîn de raport bikin da ku xebatkar çalakiyan bikarin pîlan bikin.

Raporta nehatinê bi tikandina bernameya demê ya roja heyî û bijartina bişkovka an “derketin” an jî “Nehatin/Nexweşî” û bi timamkirina ser tikandina ser bişkovka “Biguherîna” tê çêkirin.

Guherîna we dê rasterast li sepana Nuddisê ya pêşdibistanê rojane bin lê girêdayî xebatkarên pêşdibistana we ye bê ka dixwazin danûstandina dema nehatinê çawa pêk were. Raportkirina nebûn/nexweşiyê an jî raportkirina terikandinê ji bo rojên ku bernameya demê hatiye çêkirin lazîme hê kirin

Ledig	Frånvaro / Sjuk
Närvaro - Tisdag 3/4	
Från	08:00
Till	16:00
Lämnar	
Hämtar	
Dagsinfo till personal	
ÄNDRA	
TA BORT	

Ji bo rojên ku ji mêj ve bernameyên wan hatine çêkirin, hûn dikarin bi peyameke kurt agahiya ku girîng e xebatkar pê bizanin bidin zanîn. Hûn dikarin vê agahiyê bikevin qada, “Agahiya rojane ji bo xebakaran”. Mîna keke agahiya girîng ev e ku zarokê we ji ber cemidandina mîde nehatibe dibistanê.

HIŞYARÎ! Armanca berhevkirina agahiyên bi vî rengî bi tenê astengkirina belavbûna enfeksiyonê ye di nav zarokên pêşdibistanê de. Li vir, hûn divê li gel xebatkaran bi axivîn derbarê rêvebirina cureyê danûstandinê.

DANASÎN

Li vir hûn ê danasîneke basît a derbarê bernameya demê ya çend rojên nêzik a zarokê xwe bibînin.

DÎROK

Li vir hûn dikarin îstatîstîkan bibînin ku nîşan didin bê ka we li gor bernameya xwe ya pîlankirî seranserê çend hefteyên derbasbûyî çî wergirtiye û çî hiştiye.

PROFÎLA MIN

Li vir hûn dikarin binêrin ka gelo agahiyên we yê têkiliyê li Nuddisê rast in. Eger agahiyên kêr hebîn, têkevin Skolplatsen û li wir agahiyên xwe rojane bikin. Nuddis hîngê dê bi awayekî otomatîk bi heman agahiyan rojane bibe.

Bikaranîna Nuddis bi rêya sepana Android

Sepana Android xwedî malikên jêr e: *Bernameya demê û Agahî*.

BERNAMEYA DEMÊ

Kurteyeke sereke ya agahiyên zarokê we li vir tê nîşandan. Ji bo nêrînê zarokekê bibijêrin an jî bernameya demê biguherînin.

Ji bo zêdekirina bernameyeke demê, roja navborî li ser salnameyê bitikînin û demên danîn û hilgirtinê, mirovê ku dê dayne û hilgire bibijêrin û piştê bi tikandina bişkovka “Zêdekirin/Guherîn” xilas bikin.

Hûn dikarin deman ji yek hefteya tim bo çend hefteyên li pey hev kopî bikin. Bitikînin ser xetên gewrê tarî ku jimareya hefteyê nîşan didin, wek hefte 37 a li mînakê jêr û piştê hefteya ku hûn dixwazin deman li ser kopî bikin vebijêrin û eger ev yek ji bo ji yekê zêdetir zarokan derbasdar be.


Raporta Nehatinê

Eger zarokê we ji ber nexweşî an jî çûna derekê timamê rojê neyê, ji we tê xwestin ku hûn guherîna di dema zûtirîn de raport bikin da ku xebatkar çalakiyan bikarin pîlan bikin.

Raporta nehatinê bi tikandina bernameya demê ya roja heyî û bijartina bişkovka an “derketin” an jî “Nehatin/Nexweşî” û bi timamkirina ser tikandina ser bişkovka “Biguherîne” tê çêkirin.

Guherîna we dê rasterast li sepana Nuddisê ya pêşdibistanê rojane bin lê girêdayî xebatkarên pêşdibistana we ye bê ka dixwazin danûstandina dema nehatinê çawa pêk were. Raportkirina nebûn/nexweşiyê an jî raportkirina terikandin ji bo rojên ku bernameya demê hatiye çêkirin lazime bê kirin.

Ji bo rojên ku ji mêj ve bernameyên wan hatine çêkirin, hûn dikarin bi peyameke kurt agahiya ku girîng e xebatkar pê bizanin bidin zanîn. Ev yek bi rêya qada “Şîrove” tê pêkanîn. Mînakeke agahiya girîng ev e ku zarokê we ji ber cemidandina mîde nehatiye dibistanê.



HIŞYARÎ! Armanca berhevkirina agahiyên bi vî rengî bi tenê astengkirina belavbûna enfeksiyonê ye di nav zarokên pêşdibistanê de. Li vir, hûn divê li gel xebatkarên biaxivin derbarê rêvebirina cureyê danûstandinê.

AGAHÎ

Li vir agahiyeke kurt derbarê Nuddis heye, her wisa vebijarkên vekirin/girtina agahdariyan û derbarê jê derketinê.

PZP (PIRSÊN ZÊDE TÊN PIRSÎN)

Ez çawa dikarim bernameyeke demê lê zêde bikim eger derfeta min a bidestxistina Jimareya Banqê tunebe?

Eger derfeta we ya bidestxistina Jimareya Banqê tunebe, li gel xebatkarên pêşdibistana xwe biaxivin ku ew ê ji we re bibêjin ka divê hûn çi bikin.

Ez çima nikarim bernameyên demê zêde bikim/biguherînim ji bo du rojên pêşde?

Ji bo ku bikare pîlansaziya çalakiyan bike, pêşdibistan pêwîst dibîne ku guherînen bernameya we kêmtirîn di nav 2 rojan pêş de agahdar be. Eger pêwîst bike hûn di bernameyeke demê de di nav du rojan kêmtir de guherîne bikin, li gel xebatkarên pêşdibistana xwe bikevin nav têkiliyê.

Ez çawa peyamekê bişînim xebatkarên?

Peyamên kurtir dikarin li sepanê bîn hiştin. Peyamê têkevin qada şîroveyan “Agahiyên rojane bo xebatkarên” (iOS) an jî li “Şîroveyan” (Android) binivîsin. Peyam ji bo xebatkarên li pêşdibistanê nav baloneke axaftinê li kêleka wêneya zarokê ya di Nuddis sepanê de xuya bibin.

Ez dikarim bi rêya sepanê nehatin/nexweşiya zarokê xwe raport bikim?

Erê, ev mimkun e. Tê xwestin ku hûn nehatinê di wextê zûtirîn de bidin zanîn da ku xebatkar bikarin çalakiyan pîlan bikin. “Derketin” an jî “Nehatin/Nexweşî” bibijêrin û bitikînin ser “Biguherîne”.

Ez çi bikim eger venêrîna hundir/derve ya zarokê xwe ji bîr bikim?

Danûstandinê li gel xebatkarên çêkin û ew ê bibin alîkar.

Ez çima emailên demên nehatinê derbarê zarokê xwe werdigirim?

Sîstemê ê bîrxistinî bişîne navnîşana we ya emailê. Heft roj beriya dema bernameyê ya dawî pêkhatî, sîstemê ê hişyariyekê bişîne ku êdî wextê bernameyê nû ye. Eger hûn naxwazin bîrxistinî hilgirin, bo nimûne ji bo betlaneyan, zarokê we dê di bernameya demê de wek nehatî bê îşaretkirin.

Agahiyên derbarê zarokê min çiqas demê li ser Nuddisê bimîne?

Agahiyên derbarê zarokê we dê ji bo 3 salan bê veşartin. Piştî wê pardemê, agahî dê wek şexs-nediyar bîn hiştin lê dê ji bo armancên îstatîskî bîn veşartin.

Têkilî Bi Ofîsa Perwerdehiyê Çêkin

Pirsgirêkên destegê dikarin bişînin vê navnîşanê: support.utbildningskontoret@bollnas.se Ji kerema xwe pênaseyeke aşkera ya pirsgirêkê bidin, dema tişteke xirab çêbe hûn çî dîkin, telefona berîkê an jî tableteke çawa hûn bi kar tînin û gelo berê jî bi kêr dihat.